# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (245):

## Girtinine bêsûcane, dizîna kevneşopan, qirkirina jîngehê, geregoşî û vekirina mizgefteke nû, destdirêjîkirina li ser temenmezinan





















Bi ser destdirêjîkirina mezin li ser daristanên xwezayî û çandinî, û li ser zeviyên zeytûna û erdên çandiniyê jêderên serekîn ji jiyankirina nişteciyên resen re, bi qutkirina fere û şewtandinê û çêrandina bêwijdan a ku digihêje asta **qirkirina jîngehê** (weke **tewaneke li dijî mirovahiyê**), û herweha lêgerîna li kevneşopan û dizîna wan bi renegekî fere û nerewa û destdirêjîkirina li ser cîgehên dîrokî û zaretgehên olî û tarûmarkirina wan (weke **tewanên şer**), ên ku berevajîkirineke bi robet ji Yasaya Navdewletî ya mirovahî û hevpeymanênên dewletî re ne, Giropên çekdar ên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" li dirêjahiya pênc salan ji dema dagîrkirina Turkiyê ji herêmê re pêk tînin... Van herdu aliyan tu guhdan an lêkolîneke belgekirî ji aliyê "**Komîta Lêkolîna Navdewletî ya Serbixwe ya taybet bi Suriyê**" ve nedîtin, di heman dema peydabûna gelek rapor û wêne û bînerdayîn û belgeyên li ser.

**Ev jî hin bûyer û heyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên dagîrkeriyê ev girtin:**

- Piştî vegera wî ji Heleb - ciyê penaberiyê bo warê xwe li 16.3.2023an. Z, Hemwelatî "**Mehmûd Igêl /68/sal**" ji xelkê Gundê "Qornê" - Navça Bilbilê bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, û piştî ferzkirina sezayeke diravî li ser -ji bilî vêrgî û bendkirina di mercên sert de û tûşîbûna îşkencekirinê- ew li 8.5.2023an. Z berdan.

- Li 6.5.2023an. Z Hemwelatî "**Edhem Mûrad Selman, Ebid El'qadêr Osman Reşîd**" ji xelkê Gundê "Hecxelîl" - Navça Reco, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve, bi behaneya ku wan wêneyên piroseyên belavkirina alîkariya fîxaniyê yên "Rêkxiraweke fîxaniyê" kişandine, û ta niha bêsûcane bendkirî ne.

**= Dizîna kevneşopan:**

Li ser kesî ne veşartiye ku ji dema dagîrkirina Efrînê ve li 2018an. Z -bi ser pirbûna wan de- ku cîgeheke dîrokî yan zaretgeheke olî Êzdî û Îslamî nemaye û hîn rastî kolandin û tevdana rengfere û bi karanîna

amûrên lêgerînê û aletên giran nehatiye, ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên binerd û dizîna wan, ji aliyê Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ve (ya girêdayî bi Hemahengiya Sûrî - Ixwanî) û li ber çavên Destlatên Dagîrkeriya Turkiyê û bi pişikdariya Istîxbaratên wê di piraniya rewşan de, û herweha Turkiyê wek derbasgehek ji guhestin û firotina kevneşopên hatine dizîn re; Û bi sedan wêne û rapor li ser vê mijarê hatine belavkirin, nemaze di beramberkirina navbera wêneyên Gogêl Êrs de yên salin li dû hev re, bi zelalî girseya wan dijberîkirinên ku wek tewan têne jimartin û di dermafê malmewdanên çandeyî de li herêma Efrînê û Sûriyê û herweha şaristaniya ademîzadiyê xuya dibe; Û bi ser ku ew ji Yasaya Navdewletî ya Mirovahî û Belgeyên Navnetewî re berevajîkirineke bi robet e, lê dîsa jî nebû ciyê pûtpûdana "Komîta Navdewletî ya Serbixwe ya taybet bi Sûriyê" û nehat belgekirin di raporên wê yên fermî de; Jê:

**-** Ji deh rojan ve, Milîseyên "Feyleq El'şam" **Girê "Guvîjê"** Başûr Rojhilatê Gundê "Cela" - Navça Reco bi alavên giran dikolin û rêş dikin, piştî hilkirina bi dehan darên zeytûnê yên li ser gir (ê ku rûbera wê dora hiktar û nîvekî).

**-** Berdewamkirina kolandinê li Kela "**Nebî Horî**" bi alavên giran, ji aliyê Milîseyên "Ceyş El'nuxbe" ve (yên ku "El'eqîd Mu'itez Erselan - pêşengê Feyleqa diwem di Artêşa Niştîmanî ya Sûrî de" serkêşiya wan dike), û perçevîdiyûya cîgehê ya 6.5.2023an. Z û ya ragihandêrekî rikber û li Efrînê rûdine wê bûyerê tekez dike, û tê de weha dibêje:

Mixabin bi sedema piroseyên kolandin û lêgerîna berdewam, tevahiya zanînwerên cîgehê hatine guhertin!

**-** Bi beramberkirina di navêna du wêneyên Gogêl Êrs de (4 Rezbera 2019an. Z, û 20 Avdara 2022an. Z) bi zelalî girseya rêşkirin û kolandina ku li **Girê "Nêsir"** çêbûye xuya dibe; ew girê ku li hember çateriya Gundê "Edema" - N. Reco dikeve, bi /300/M dûrî Çemê Reş ê hevsînor bi Turkiyê re, rûbera wî dora /1.66/hiktarî ye, li ser zeviyên zeytûn û tirî hatibûn çandin û yên zaroyên Dilovanber "Sewranê Edema" bûn, û weha jî hin darên sindiyanê yên temenmezin li ser bûn; Û herweha jî kolandina di nav zeviyeke zeytûna de (bi rûbera/0.23/hiktarî) li Başûrê gir, ji aliyê Milîseyên "Feyleq El'şam" ve, yên ku ("Munzêr Siras/Ebû Ûbade" - endamê Desteya Siyasî di Hemahengiya Sûrî de weke pêşengê giştî, û "Fedil Elah El'hecî/Ebû Yamên" jî weke pêşengê leşkerî) serkêşiya wan dikin.

**= Destdirêjîkirina li ser daristanan û qutkirina darên zeytûnê:**

**-** Li Gundê "**Keferdelê Jêrin**" - Navça Cindirêsê (yê ku Milîseyên "Firqit El'hemze" wî desteser dikin), li 16.4.2023an. Z ji bo êzinkirin û bazirganiyê /15/darên zeytûnê yên Hemwelatî "Mehmûd Zêno" û /5/darên "Selah Ebid El'rehman Zêno" û /4/dar jî yên "Kemal Menan Ebid El'rehman" bi şêwakî hovane û bêwijdan hatin qutkirin, û berî wê jî bi demeke kin /30/darî yên "Enwer Xelîl Ebid El'rehman".

**-** "Berevaniya Sivîl li Efrînê" tekez kir ku tîpên/tîmên wê li 7.5.2023an. Z agirek li **hirşê Gundê "Merwaniyê"** - N. Cindirêsê vemirandin, bi ser çetiniya rê û zehmetiya gihîştinê de; Û bi hûrgilîkirina wêneyên ku ji aliyê wê ve hatine belavkirin, girseya qutkirina fere ji daristanê re bi zelalî diyar dibe û kok û bermayên êzingan xuya dibin, ev jî gûmana şewtandina mebestkirî ya ji bo serpeçnandina piroseyên qutkirinê ji aliyê Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ve mêldar dike, çimkî him cîgeh ji riyên cûn û hatine ve dûr e û him jî pileya germahiyê hîn nizm e, yanê tu sedemên agirpêketina jixweber tune ne.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li 6.5.2023an. Z, gizgiziyeke leşkerî û komserhevkirineke çekdarane di nav endamên herdu Êlên "**Lihêb û Igêdat**" ên anînde de rûdan, li Bajarê Efrînê û Navça Şera, li ser dijberîkirina endamin "Lihêbê" ji temenmezinekî "El'igêdat" re û kêmrûmetkirina wî û belavkirina wêneyên wî li ser alavên hevgîhandina civakî; Ji ber wê jî makînên tijî çekdar ji "El'igêdat" Bajaroka Şera basmîş kirin û daxwaza kiryardaran kirin, ta ku lihevhatinek di nav herdu aliyan de hate çêkirin.

**= Vekirina mizgeftekê:**

Li 28 Avrêla 2023an. Z, "Kargêriya Fetwê û Ewqafê û Rewşên Olî li Efrînê" vekirina "**Mizgefta El'îmam El'şafi'î**" ragîhand (a ku li ser erd û mewdanên taybet li Taxa Eşrefiyê hatiye avakirin); Di çarçewa tevgereke olî ye tundrew û çalak de ye ku herêm dibîne, ji dema dagîrkirina wê li 2018an. Z ji aliyê Turkiyê û hevaltiya giropine Sûrî yen çekdar en nandoz û hin din en cîhadîst û Îslamî û tundrew ve.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Li şeva 6.5.2023an. Z, giropeke çekdar e serçavgirtî mala temenmezinê Kurd "**Fewzî Xelîl Hebeş** /70/sal" li Gundê "Kerê" - Navça Bilbilê basmîş kir, li herdu hevjînan xistin û di odeyekê de hepis kirin, û paşê jî tibabin diravî û du telîfûn xilyewî û hin cereyên gazê dizîn.

**-** Li 9.5 2023an. Z, anîndeyina şerê xwe di temenmezinê Kurd "**Mîrza Dawod**" ji xelkê Gundê "Kîmarê" - Şêrewa û xortê ku vê re kar dikir dan, li pêş dîkana wî û li orta Kolana Reco li Bajarê Efrînê, bi sedema nelihevkirineke şênberî/dirawî.

Ji erk û stubariya "**Komîta Lêkolîna Navdewletî**" û Destgehên Yekîtiya Nevnetewî yên taybet bi Sûriyê û rêxistinên sivîl û mafnasînê (yên pûtûpêdanê bi malmewdanên çandeyî û jîngehî û çandiniyê dikin) ye, ku guhdanê bidin pûtûpêdana wan, û tewan û destdirêjiyên ku di dermafê wan de li Herêma Efrînê ya dagîrkirî bi şêwakî fere û rêbazkirî têne kirin aşkere bikin.

14.05.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Girê "Guvîjê" Başûr Rojhilatê Gundê "Cela" - N.Reco, Gogel Êrs li 20.3.2022an. Z.
- Kolandinên Kela "Nebî Horî", ji perçevîdiyûke çalakvanekî ragîhandinê 6.5.2023an. Z.
- Girê "Nêsir" li hember çateriya Gundê "Edema" - N.Reco, Gogel Êrs(4 Rezbera 2019an. Z, 20î Avdara 2022an. Z).
- "El'eqîd Mu'itez Erselan" - serkêşê Milîseyên "Artêşa/Ceyş El'nuxbe" û "Feyleqa Yekê/Artêşa Niştîmanî ya Sûrî".
- Şewatek li Hirşê "Merwaniyê" - N.Cindirêsê, berevaniya sivîl 7.5.2023an. Z.
- Amedebaşiyek ji giropên Êla "El'igêdat" ên çekdar ve li Bajaroka Şera, 6.5.2023an. Z.
- Vekirina Mizgefata "El'îmam El'şafi'î" li Taxa Eşrefiyê - Efrîn, 28.4.2923an. Z.